# Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya 1957

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (239) | Sibat / 15-2-2023


# Cindirês birîneke kûr di bîra her Kurdekî de ye



**Kurdistan**

Piştî erdheja Cindirêsê ku di encama wê de, hejmareke zêde ya xelkê bajarokê Cindirês jiyana xwe jidest dane, û hejmareke avahî wêran bûn, bi hezaran xelkê Cindirêsê derbider bûn. Vê yekê dilgiraniyeke mezin li cem Kurdên çar perçeyên Kurdistanê çê kir, dengekî zêde jî veda, bi taybet ku ti aliyek nebû bi hewara wan ve biçin, lê piştre bi hewlên zêde yên Hikûmeta Herêma Kurdistanê Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî bi rêya dergehê Bab El-Selame derbasî Cindirêsê bûne, û li ser xelkê zirar dîtine hatin dabeşkirin. Alîkariyên Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî karvedan li pey xwe ve anîn. Welatiyekî Efrînê, dibêje me bi ala Kurdistanê pêşwazî li Dezgehê kir, ji ber ku xelkê me bi hewceyî piştevaniyê bûn, ne tenê alîkarî, belku li benda piştevaniya Herêma Kurdistanê bûn ji ber Efrînê ev çend sal in dinale. Welatiyekî din jî dibêje, hatina Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî moralê wan bilind kir û êşa xwe jî hinekî jibîr kirin, ev yek ji bo wan tiştekî giring e.

---


**Kar û çalakiyên Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî li Efrînê berdewam dibin** *Rûpel—2*

**Jiyan ji bo Çemê Xabûr vegerya** *Rûpel—3*

**Pirtûka «Destanên Barzaniyan» hate belavkirin** *Rûpel—4*

# Kar û çalakiyên Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî li Efrînê berdewam dibin

**Kurdistan**

Encûmena Xwecihiya Efrînê ya Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê (ENKS) ji ber hawarhatina Herêma Kurdistanê û Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî bi ziyandîtiyên erdheja Efrînê re, spasiya Serok Barzanî, Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî û Herêma Kurdistanê dike. Encûmena Xwecihiya Efrînê ya ENKSê di daxuyaniyekê de, bi navê gelê Kurd li Efrînê bi giştî û bi navê Cindirêsa birîndar bi taybetî, spasiya Serok, kadro û rêveberiya Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî, Serokê Herêmê, Serokê Hikûmetê û gelê wê û Serok Mesûd Barzanî kir, ji ber ku bilez bersiva bangewaziya gelê Efrînê dan û bi hawara wan ve çûn. Di daxuyaniyê de hat gotin: “Serkeftina hewlên bênavber ên serkirdayetiya Herêma Kurdistanê û Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî bo derbaskirina hemû astengiyan û gihandina karwaneke mezin a alîkariyên bo Cindirêsê, bû sedema geşkirina moralê û kêmkirina hestên xem û êşên gelê Efrînê.” Piştî erdheja li Efrînê rû daye ku bi sedema hilweşîna bi sedan xanî û avahiyan li bajarokê Cindirêsê û hin gund û navçeyên din ên Efrînê û di encamê de zêdetir ji




700 kesî canê xwe ji dest dane û bi hezaran kes bê cih û war man, 10ê Sibata 2023an, yekem karwana alîkariyê ya Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî gihîşt Efrînê. Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî bi mebesta gihandina karwanên alîkariyan ji bo mexdûrên erdhejê yên li Kurdistana Sûriyê, û Sûriyê, ofîsekê li Efrînê vedike. Serperiştyarê Tîma Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî yê li Bakur û Rojavayê Kurdistanê Rewac Hacî ragihand, “Emê derman û pêwîstiyên tendirustiyê radestî Nexweşxaneya Efrînê bikin, çimkî Nexweşxaneya Cindirêsê ji ber erdhejê nemaye.” Hacî eşkere kir, bi mebesta gihandina alîkariyên zêdetir ji bo mexdûrên erdhejê, ew ê Ofîsa Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî li bajarê Efrînê vekin û her roj karwanên alîkariyan bigihînin navçeyê û pêşkêşî mexdûrên erdhejê bikin.

# Gewîlan.. Helmeta danheva alîkariyan bo qurbaniyên erdheja Cindirêsê



**Idrîs Hiso- Gewîlan**

Li ser bangewaziya Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya helmeta danheva alîkariyan jibo lêqewmawên erdlerza ku li Bakur û Rojavayê Kurdistanê qewimîbû destpêkir, helmetê li seranserî Herêma Kurdistanê destpêkir, kurdistaniyên Herêma Kurdistanê û Rojavayê Kurdistanê beşdarî vê helmetê bûn. Li Kampa Gewîlan jî helmetê destpêkir û nişteciyên kampê ku penaberên Rojavayê Kurdistanê ne bi dilgermî bi jin, mêr, pîr û kal û zarokan beşdarî vê helmetê bûn, her yekî ji aliyê xwe ve tiştê ku karîbin xistin destê xwe û anîn dan destê komîteya hilmetê ku ji aliyê rêxistina PDKSê li kampê hatibû destnîşan kirin. Hisên Şahîn ku bi temê xwe 70 salî ye, komek alîkarî anîn û wisa got: “Îro roja himetê ye, birîn birîna me hemiya ye, birîna mirovantiyê ye, lê kes xwediyê me Kurdan nîne ji Kurdan pêve, îro birayên me li Efrîn û Cindirêsê ji derdê erdlerzê dinalin, ew li wir birînbûne, em li vir dikin qîrîn.”Herwisa dibêje: “Birano hûn çi karibin bikin, bikin li wir xelk bê mal mane, li çolan e xaniyên wan bûne kavil, ew hewcedarî her tiştî ne, ji avê heta bi pere û keresteyên nav malê.” Ji aliyê xwe Dêya Mesrûr got: “Ez bang li her mirovekî, û li dewletên cîhanê dikim, bila destê yarmetiyê dirêjî Efrîn û Cindirêsê jî bikin, ne tenê alîkariyan rêbikin bo Tirkiyê, berê xelkên me ji derdê çekdarên terorîst dinalin, ji dagîrkeriya Tirkiyê dinalin, vê Zivistanê erdlerz jî bi ser wan de hat, em dê ji aliyê xwe ve tiştê ji dest me tê em dê bikin, em daxwazê ji aliyên pêwendîdar dikin ku ew komên alîkariyan bi zûritîn dem bighên destê qurbaniyên vê belaya mezin”. Endamê Komîteya Herêmî ya rêxistina PDKSê li Gewîlan Mihemed Silmêman Gabarî got: “Li ser dawaz û bangewaziya me dest bi helmetê kir jibo alîkariya Efrîn, Cendêris û gundewarên wê, me dest bi helmeta danheva alîkariyên diravî û kelûpelan, em sersaxiyê ji miletê xwe re dixwazin û em dibêjin em ligel we ne di vê êşê de.” Balkêş bû ku heta bi zarokan jî beşdarî vê helmetê kir, yek ji beşdarbûyên vê hilmetê nexwest navê wê bê gotin dibêje: “Min zarokê xwe anîn, min pare da destê wan û min ji wan re got van pareyên xwe wek alîkarî bişînin ji zarokên Efrînê re, divê zarok jî fêrî alîkariya welatiyên welatê xwe bibin.” Her carekê karesetek bi serê welatê me û welatiyên Kurdistanê tê, di rojên asê û zehmet de, Kurd bitaybetî û Kurdistanî bigiştî wê yekê nîşan didin ku ew welatiyê yek welatî ne û dê bimînin alîkarên hev heta roja bidestxistina azadî û dadperweriyê, ev miletê mirovdost û aştîxwaz hêjayî welatekî serbixwe ye.

# Jiyan ji bo Çemê Xabûr vegerya

Azad Haco-Tiltemir

Çemê xabûr çemekî naskirî û navdare li Sûriyê û li Rojavayê Kurdistan jiyana mirovan ji mêj ve li derdora wê hebû çimkî pirr girr li beravên wê hene bê guman jiber lehî û tofanên ku berê qewimîne jiyan lê di rawestiya,, hêjaye gotinê ku bi hatina dagirkeriya inglîz û ferensiyan bû devra erebî û kurdistanê disalên 20 û 30an de ji çerxa bûrî ve wan dagirkeran asûrî an( aşûrî ) ji îraqê anîn û belavî beravên xabûr kirin nêzî 20 gundan bi wan hatin ava kirin û gundê herî mezin til temir bû ku îroj bajare û navende herî mezin a aşûriyan bû,, di serdema dgirkirna firensiyan de pirek hat saz kirin ku rojhilat û roavayê çem pevre girêd û bi dever û parêzgehên nav sûrî hat girêdan, birastî aşûriyan ev babet keyis kirin di xizmeta xwede lewma kar û xebatek baş kirin û derdora xabûr gund û bajarr tev kirin bexçe û gulîstan tev kirin



darên sêv û hinar û hirmî û zerdeliwan û rezên tirî ku pirr pê navdar bûn wate tu kare bêje ku bûhişteke biçûk li vî warî ava kirin,, di dûvre kurd û ereb jî hatin til temirê bi mebesta çandinyê jiber xaka wê bi xêr û bêr bû bi saba ava xabûr û bihevre her sê netewa wek xwişk û bira jiyan meşandin êş û kêfxweşiyên wan yek bûn bajar mezin bû û bi hevre avdan kirin lê dema rêjîma ba's hat ser deshilatê rewiş hinekî hat guhertin tev hevî çêdkir aşûrî û ereb bi alî xwede anîn û ew dijî kurdan car caran bi kar tanîn lê kurda bi zanebûnî ev pîlan dişkandin û ne dihiştin ku ew têiliyên baş ku dinav wan de hebû pûç bibe.



Tiltemir bû bajar encumena bajarvaniya wê çêbû geşedan û avdan kirin bêhtir bû bi saya aşûriyan jiber wan xwe bi deshilatê girtin û bûn serokê bajarvaniyê çi ji deshilatê di xwestin dida wan,, riyên nûjen saz kirin havîngeh û xwaringeh û cihên melevaniyên moderin ava kirin  xelk ji her bajarên sûrî û deverên kurdî di hatin serdana til temirê av pirr bû alktrîk 24demjmêran bû yeqîn gava buhar û havîn dihat ev bajar di xemilî bi keskatî û bi bihna gul û kulîlkan û darên zeyzefûnê ku biser bajar de difûriya merev pirr pê dil xweş dibûn îjar xelkê me derdiketin nav wan dar û berên nêzîkî xabûr û çemê zirganê bihna wan fireh dibû û dil vehesîn dibûn bi keskatî û dengê teyirik û çûkan liser xabûr,, jinan û zarokan pincar û sitrî zerik radikirin dixawarin û pincar tanîn malên xwe dikirin firavîn yan şîv û dixwarin û zarokên law û xort û zilam diçun  çemê xabûr û zirganê nêçîra masiyan dikirn hem difrotin û hem jê dixwarin pirr pirr xweş û bi lizet bû,, em dikarin wiha bi gelemperî wesif bikin ku tevî sitem û zordariya rêjîma ba's jiyan baş derbas dibû tevî ku pirr ji miletê menî kurd koçî şam û parêzgehên sûrî bûn piştî serhildana miletê me 2004an dijî rêjîma faşîst hîn jî jiyan nûrmal di qediya jiber rêjîmê deverên me kirin tengaviyeke pirr zor û zehmet,, lê mixabin bi despêkirina şoreşa gelê sûrî dijî rêjîmê di 2011an de me pêşbînî dikir ku welat bêhtir xweş û geş bibe û ji sitemê qurtal bibe û  hêminî û aramî bêhtir bibe me dî kû rewiş berovajî bû,, her û her bi ber xerabûn û kampaxiyê ve çû naxasim li dever û bajarê me bisedema hebûna sê netewan livir û jiber til temir dikeve xêza temasê de navbera deverên erebî û kurdî de û jiber afirandina tev hevî ji layê rêjêmê ve di navbera pêkhatiyên wêde lewima şer û pevçûn kete navbera kurd û birayên me ereban de di nîsana 2013an de bajar dorpêç bû hin diz û çete ji devrên dûr hatin dizî û talanî kirin rêjîma erdoxan jî ava xabûr û zirganê bi yek carî qut kirin wan çeta dest bi xirakin û rakirina dar û bexçeyên gundên aşûriyan kirin teqîn li derdora wan dikirin da tiris têkev dilê wan û dev ji gudên xwe berdin û koç bibin,, mixabin em karin bêjin ku wek fermanekê biserê wan de hat dema DAIŞê di sibata 2015an de êrîşî til temir û gundewarên wê kirin û aşûriyên gunda pirr ji wan dîl girtin dor sê kesan belkî bêhtir ji wan şehîd kirin lê piştî dest werdana hin dewlet û şêxên ereban beramberî peran ew tev ser best hatin berdan lê nema vegiriyan warên xwe êdî dest bi koçberiya dervey welat kirin,, ne ew tenê hin kurdên me û ereb jî koç bûn lê bi rêjeyek kêmtir jiwan,, di halê hazir de gund û bajar aşûrî pirr lê kêm mane tenê hin mezin û pîr û kal mane, lewima bi koçbûna wan xabûr miçiqî xak axa sor tenê maye ew sîma û jiyana xweş ya bajar bi wan re koç kir,, yanî bera em rast go bin ku bajarê til temir bi wan bû mîna meteleke me kurdên Til temir heye dibêje, aşûrî xwê ya vî bajarî bûn.

# Pirtûka «Destanên Barzaniyan» hate belavkirin

**Kurdistan**

Pirtûka Rojnamevanê Kurd Şêxo Efrînî ya bi navê “Destanên Barzaniyan” bi zaravê Kurmancî û bi tîpên Latînî hate belav kirin. Ev pirtûk yekem pirtûka Şêxo Efrînî ye.

## Naveroka Pirtûkê

Ev pirtûk behsa dastanên Barzaniyan dike, herwiha lixwegirtina Serxwebûna Kurdistanê, ji berxwedana Şehîd Ebdulselam Barzanî û Şêx Ehmedê Barzanî heta bi jeneral Mela Mistefa Barzanî û rola wî ya giring di Komara Kurdistanê û Şoreşa Eylûlê ya pîroz û piştevaniya wan ya bê sînor ji şoreşên Kurdî re li perçeyên din yên Kurdistanê. Di pirtûkê de, behsa serkirdayetiya Serok Barzanî û Nemir Idrîs Barzanî di Şoreşa Gulanê de dike di çarçoveya tevgera rizgarîxwaza Kurdistanê. Jibilî vê yekê, di pirtûkê de behsa biryara dîrokî ya Serok Barzanî ya referandoma Herêma Kurdistanê tê kirin, û piştevaniya wî û ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji bo gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê û şandina Pêşmergeyan ji bo rizgarkirina bajarê Kobanê ji destê çekdarên DAIŞê, û pêşwaziya wan bi hezaran penaberên Kurd yên ji agirê şer li Sûriyê reviyane. Di beşekî din yê pirtûkê de, behsa pêşketinê li Herêma Kurdistanê û ewlekarî û aramiyê dike ku niha Herêma Kurdistanê bûye qubleta cîhanê wek cihekî steratejîk di jêr sîwana serkirdayetiyeke genc de.




## Şêxo Efrînî kî ye

Kolêja Wêjeyê beşê Zimanê Erebî li Zanîngeha Helebê xwendiye, niha wek bêjer û pêşkêşkarê bernameyan li kenala ARK kar dike, ew bi xwe ji gundê Avrazê yê Efrîna Kurdistana Sûriyê ye, di sala 1986an jidayik bûye. Di sala 2013an de hatiye Herêma Kurdistanê, zewicî ye û du keçên wî hene.



# Daxwaza Dayîkekê



Henan Cefer

-Rewşen di hindir malê de westiya ye destê xwe hêdîka da erdê û hêz da xwe û rabû, dev da rêya bîrê ku xem û nîgaşê xwe bi sirûşta xemlandî re birevînê, pişta xwe da koka dara çinarê û dûr nêhirî ket bîranînên xwe, roj diborand, Reşoyê nêçîrvan ji wê de hat dema li rewşa wê pirsî tavek daxbar bi ser de barî axînek ji kufta dil derket û got aax keko ez bi qirban çi bêjim çi nebêjim vê cengê şerekî mezin li darxist û em kirin kirasekî reş û teng em ji hev bûn, her yek bi cihekî de çû mişext bûn, ne dê bi zarokan ne jî zarok bi dayîkan spartin û şad bûn. Bilebile ne dêpîr neviyên xwe nas dikê û ne bi wan hîs dibê ger tî ne birçî ne çimkîn dûrin û ne jî nevî dêpîr û bavkalê xwe nas dike çimkîn li biyanistanê ne, em di xewa şevan de nedîtine ev guneha kê ye, ma emê çi bikin ji vê rewşa xapînok. Kêlîkeka girî di gewriyê de çû û hat rondikên çavên xwe bi koçilê desmala serê xwe paqij kir û domand tu dizanê keko her du kurên min şilêr û dilêr li biyanistanê dewata xwe kirin min nedît û heya niha ez bûkên xwe nasnakim erê li ser ekranê telefone mîna biyaniya bi min re dipeyvin, xoş û bêj diçin li rewşa min dipirsin lê dûrîtî windabûn e, dûjeh e, kirêt e

-Keko ahînek kûr di dilê min de wek heştpê dilive û êşkence dike, kizoteke giyanê min dax didê û dişewtînê, xwazaa keko xwaza berî mirinekê em li hev biciviyana minê yekoyek ramûsan û bêhn kiribana bila wê demê giyanstîn giyanê min bibira ev yeka bûye hesret di dilê min de û mayî, heyran we ti qisûr nekirî mixabin eger qisûrek hebe jî ji min e....

-Keko ev rewş netê êtir kirin, giyanê min li ber têhna van destdirêjiyan disincire, pirsek di sîngê min de her meziiiin mezin dibe ”heya kîngê emê şerpeze û bindest bin”

